

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Xwendevanê delal

Bi alîkariya we hejmara KULÎLK-ê ya şesan ji derket. Ji boyî alîkariya we em geleki spas dîkin. Lê ji bo ku KULÎLK bikaribe jiyana xwe bidomîne, pêwîst e ku hûn alîkariya xwe jê nebirin. Weke ku hûn dizanin, çawa dara ku neyê avdan û xwedî kirin hişk dibe, wilo ji KULÎLK bê alîkarî û rexneyêن we dê biçilmise û bimire. Em hêvidarin ku hûn rewşa KULÎLK-ê bidin ber çavêن xwe û lê xwedî derkevin.

Sîlavan li we dike

KULÎLK



Cegerxwîn

SERXWERABÛNA MİRİŞKAN

Li welatê me Xerza,
Dîkek hebû şehreza.

Rokê ew çû nav dîka,
Ji wan re go hêdîka:

Rabin bêjin mirîşkan,
Bes xwe bidin enîşkan.

Dîk û mirîşk bûne kom,
Berê xwe dane cem bûm.

Leşker tev de bûne lek,
Hin çeleng û hin kulek.

Berê xwe dane çolê,
Tevlî koç û tev êlê.

Teyra dî ko nagehan,
Hati leşkerkî giran.

Tev de firîn ji malan,
Berê xwe dane balan.

Ew jî li hev bûne kom,
Yekî rabû gote bûm;

Ey padîşahê teyran,
Wey serbilindê Tûran.

Rabe ser xwe tu mîro,
Ji bo me bêje îro;

Ev leşkerê bê jimar,
Gelo heye jê zerar.

Bûm kenî û gote wan;
Ba kin bazê pehlewan.

Hudhud rabû serefraz;
Wi çû bi lez gote baz:

Go rabe ey tu bazi,
Şeh te îro dixwazi.

Baz çû cem şeh li bani,
Destê xwe l'ser hev danî.

Go ey xwendekarê min,
 Zû li min ke barê min,
 Bûm gote bazê xwinxwar,
 Bi lez rabe here xwar.
 Bazî rabû weke şer,
 Firek da xwe hate jér,
 Bazê terî bi rêşî,
 Hate cem dîkê pêşî,
 Destê wî girt û hejand,
 Nitqek jê re dirijand.
 "Olan sen nêrelisîn ? "(1)
 Go em xelkê Bedlis in.
 "Sizin bûrda ne iş war ? "(2)
 Dîk xeyidi lê da dar.
 Bazî şehda xwe anî,
 Dîk ji darê xwe dani.
 Go bi zor û bi gazin,
 Em heqê xwe dixwazin.
 Baz go ki ye serleşker ?
 Go tu nizani ey ker,
 Ez im paşa, ez im mîr,
 Ez im şahê cihangîr.
 Bazî çû cem dîkê di,
 Di ko ew ji weki wi.

(1) Yanî: Kuro tu ji kû yi ?

(2) Yanî: İşê we li vir ci ye ?

Tevan go paşa û mîr,
Kesī ne go ez wezîr.

Nefer bûne yûzbaşı̄,
Heta giha ê paşî,
Bazī rabû çû banî,
Li ber destê bûm danî.

Tilûr tev lê bûne kom,
"Qale ya ey-yûhel qewm"
Ev hatine ji mala xwe,
Divê istiqqlala xwe.

Bûm go bazê dilawer,
Gelo kī ye serleşker.

Go tev paşa û mîr in;
Bê wezîr û gizîr in;
Bûm hêdī rabû ser xwe,
Taca xwe da serê xwe.

Go bi taca serê min,
Kes nîne hemberê min,

Rabin wek pehlewana,
Dê em herin ser wana.

Hatin teyrê dubirak
Ba kirin kund û qirak.

Go hon werin binêrin,
Ka em iro çi mîr in,

Dîka xwe de enîşka,
Bû qîrqîra mirîşka.

Go fermana we rabû,
Koma wa j' hev bela bû.

Ê ko kuştin ê ko man;
Hatin gundan bê goman.

Wan ji weke me kurdan,
Destê xwe j'ber xwe berdan.

Elok û tûtik û qaz,
Tev de bûne belengaz.

Tev de ketin koxê reş,
Çîroka me ji we re xwes.

Wek seydayê Cegerxwîn,
Hemî bûne dilbirîn.

CEGERXWÎN

GA Ü KER

Rojekê ga diçe cem kerê û jê re dibêje :

- Heyran, evan ez bi vî cotî kuştım. Ev serê mehekê ye ku bi min cot dikan. Ka tu nikarı şîretkekê li min biki, ku ez hinekî bêhna xwe ve-kim? Ker li ga vedigerîne û dibêje :

- Pir hesan e. Îşev ku êm dan te, tu êmê xwe mexwe, wê çaxê tu ê ji cot xelas bi.

Ga dibêje: - Bi xwedê ev gotina te ket serê min.

Êvarê xwediyyê ga tê, alifê wî tiji ka û kizin dike, lê ga madê xwe nexwes dike û devê xwe nade êmê xwe. Sibehê xwediyyê wî tê ku ga bibe cot, dinêre ku ga mexel e û devê xwe kiriye erdê. Li alifê wî dinêre ku êmê wî hê tevde di cihê xwe da ye. Mêrik bi lez diçe cem kevaniya xwe û jê re dibêje :



- Bi xwedê gayê me nexwes e... vêca emê çawa bikin? Kevaniya wî dibêje: - Tu dikari bi kerê û gayê din cot biki, heta ku ga rihet bibe.

Gotina kevaniyê dikeve serê mîrik. Radibe kerê û gayê din dide ber xwe û dibe cot. Heft-heşt rojan bi wan cot dike. Ker di ber cot de gelekî di westiya. Paşê ker tê cem gayê nexwes û jê re dibêje: - Hevalo, tu dizanî ci ye?

- Ga lê vedigerîne û dibêje: - Xêr e! Ci qewimiye? Ker dibêje: - Bi xwedê, dengê mîrik û kevaniya wî hate min. Digotin:

- Ga ji bona cot e! Madem gayê me nexwes e û nema cot jê tê, emê wî şerjêkin û goştê wî ji xwe re bifirosin. Ga gelekî tirsîya û ji kerê pîrsî: - Vêca wê çawa bibe? Kerê got:

- Rehet e. Ku işev êm dane te, tu êmê xwe xelas biki, wextê sibehê bibînin wê bêjin ga-yê me rehet bûye.

Evarê xwediyyê ga dîsa alifê wî tijî ka û kizin kir û çû. Wextê serê sibehê hat, dît ku ga tiştek di êlif de ne hiştîye. Pir kîfa wî hat ku gayê wî rehet bûye. Ewî ji xwe re got:


- Vêca ezê bi herdû gaya cot bikim. Bi vi awayî kerê xwe ji cot xelas kir. Çiroka min ji we re xwes.

LÊ GERİN

Her rêz ji sê peyvan pêk hatiye. Peyvek
ji wan li herdu peyvên din nayê. Gelo
ev peyva kîja ye ?

mange	dest	golik
şîr	mast	gul
sêv	dismal	hermi
pisik	küçik	kevir
mase	çay	çaydan
palas	dar	kulav
xweli	zêr	zîv
dê	kursî	bav
dibistan	xweng	bira
av	dest	bêçi
sako	kum	hesin
rocik	kêr	kevçi
dar	kaxet	çem
nexwes	kamyon	nexweshane
sol	ling	çav
deşt	mih	şîr
kursî	zebeş	mase
hesp	zivistan	havin
fêki	şêr	zerzewat
rojname	zebra	ker
xwarin	zinar	vexwarin
berx	berf	baran

NAVÊN HIN TEYRIKAN



kund

bav: yê nêr

dê : ya mêt

zarok: çêlik




darkut, tiktikok

bav: yê nêr

dê : ya mêt

zarok: çêlik




qirag

bav: yê nêr

dê : ya mêt

zarok: çêlik



çûkê beytik, çûkên nâv gund

bav: yê nêr

dê : ya mêt

zarok: çêlik



qijak, qijik

bav: yê nêr

dê : ya mêt

zarok: çêlik

HEWŞA DIBISTANA ME

Hewşa dibistana me
Herçar alî lêkiri
Hundir hewşê de bexçe
Jêri wê rezê tirî

Her sibe ku ez diçim
Berî têkevîm dersê
Ez zû bexçe av didim
Bi satil û teneke

Ez ber leman çêdikim
Bi tevrî û bi bêrê
Pelên ku hişk jêdikim
Ji bonî gul pê ve bê

Bexçê dibistana me
Pir hişin e wek kevzê
Gava ku mirov diçê
Bêhna bihuştê jê tê

Hewşa dibistana me
Herçar alî lêkiri
Hundir hewşê de bexçe
Jêri wê rezê tirî

FIRAT CAWERÎ

MIJÜLİ

KOMA FÊKİYAN



Ew tiştên jor, hemî fêkî ne ji xeynî
tiştekî.? Gelo kîjan e.

R I N D È

Rindê, keçekē heft salî ye û diçe dibistanê. Mamosta wê li ser tiştên ku gerek zarok bikin peyivibû. Tiştên ku hatibûn guhê Rindê geleki li xweşiya wê çübûn. Gava ku Rindê êvarê hate mal, ji diya xwe pirsî û got :

- Dayê tu hinek pere nadî min ?

Diya Rindê :

- Tu li malê dixwe û vedixwe, tu ê ci biki ji pera ?

Rindê : - Dayê, ezê ji xwe re firçeyek dirana bikirim. İro mamosta min li ser paqijiye qise kir û tiştên ku digotin gişt rast bûn û divê mirov bike!

Diya Rindê : - De ka bêje bê mamosta we iro ci got ?

Rindê dest pê kir û got : - Ji ber ku xew ji bona zarokan geleki baş e û ji bo ku bikaribin sibehan zû ji xew rabin, divê zarok êvaran zû rakevin. Sibehan gava ku zarok radibin divê dest û rûyê xwe baş bişon û taştêke baş bixwin. Piştî taştê diranê xwe qenc firçe bikin. Di navbera taştê û firavînê de tiştên ku ji bo diranê zarokan ne baş be nexwin. Ku bû nîvroj, firavîneke xweş bixwin, ku li mal bin dîsa diranê xwe bişon. Berî ku êvarê rakevin diranê xwe û dest û ruwêñ xwe qenc bişon. Sibeh û navrojan zarok bixwe dikarin dest, rû û diranê xwe bişon. Lê êvaran di-


vê diya wan, yan jî bavê wan alîkariya wan bîke û li diranê wan binêre bê ka paqij bûne yan na? Ji ber ku xwarin di ber diranan de bimîne û mirov rakeve, ew xwarin diranan pir xerab dike. Ji ber vê yekê gelekî pêwîste ku kesek mezin diranên zarokan kontrol bike.




Tiştên ku Rindê gotin ketin serê diya wê. Roja din dayka Rindê wê bir û çûn dikane. Ji Rindê re firçeyek diranan yek biçûk û ji xwe re yeke mezin kirîn û hatin mal.

Ji wê rojê şûnda Rindê bi alîkariya dê û bavê, tiştên ku mamostê wê jê re gotibûn, hemû bi cih anîn. Ji ber ku Rindê sê danê xwe di wextê de dixwar; laşê xwe, dest rû û diranên

xwe qenc dişûstin, êvara di wextê xwe de radi-ket û sibehan di wextê xwe de radibû, roj bi roj weke şitlek rihanê bejin dida, bêhn û ta-ma devê wê geleki xwes bû. Hevalên wê jê acis nedibûn û gişan dixwestin bi wê re bileyizin. Diranên wê weke libêن birincê xwesik û sipî bûn.





ŞIVANÊ DEH MÎHAN

Şivanek hebû, şivanê deh mîhan bû. Axê wî, ne xwarinek xweş dida wî û ne ji tu pere didanê. Rojekê şivan fikiri û ji xwe re got:

- Bi xwedê ezê mihekê bifroşim. Ma wê axe ji ku zanibe ku min mihek firotiye ?

Rojekê şivan li çolê ye, dît ku tacirek heyvana ji wê de tê. Jivan çû pêşıya tacir û jê re got:

- Mîhek min heye tu nakırî ? Tacir gotê:

- Belê, ez dikirim.

Şivên rabû mihek firot mîrkê tacir. Gava ku şivan êvarê hat mal, axe derket pêşıya mîhan û mîhîn xwe hejmartin, dît ku yek kêm e.

Axê gote şivên:

- Kuro şivan mihek kêm e !

Şivên got:

- Na axe, ne kêm e.

Axê got:-Lawo, vaye neh mîh in. Erê neh in şivan got.

Axê got: - Sibehê çaxê te mîh birin çolê ne deh bûn ?

Şivên got: - Belê deh bûn.

Axê got: - E, lawê min vaye neh in.

Şivên got: - Erê, ji xwe neh in.

Axê dît ku şivan naxwaze fêm bike. Rabû çû ji nav gund deh merî anîn û ji şivên re got:

- Lawo, ev ne deh meriv in ?

Şivên bersiva wî da û got: - Belê deh in.

Axê carek din pîrsî got: - Ma gava ku sibehê te mîh birin, ne deh bûn? Belê deh bûn, şivêngot.

Axê ji meriyan re got:- Ka her yek ji we ji xwe re mîhekê bigrin. Merî rabûn xwe avêtin mîha, her yekî ji xwe re mîhek girt, meriyek zêde ma.



Axê got: - Lawo şivan,ka miha vī merî,vaye li hev dernakeve ?

Şivên got:

- Bila ewî ji stûyê xwe bi şikenanda û ji xwe re yek bigirta.

Axê carek din got: Emê ji nû ve bikin ku her meriyek ji xwe re mihekê bigre !

Şivên got: - Baş e.

Her deh meriyan carek din xwe avêtin mîhan û her yekî ji xwe re mihek girtin, carek din meriyek bê mîh ma.

Axê got:- Şivan,dîsan meriyek bê mîh ma ?


Şivên got:

- Ma çavên wī kor bûn,ewî cara din dît ku meriyek bê mîh ma, bila ewî ji zû bikra û ji xwe re mihek bigirta.

Axê dît ku tiştak ji şivên dernakeve.Gote şivên: - Bela te li te bikeve û dev jê berda.

Çîvrokek ku li nav Kurdan tê gotinê

VANA BIKE COT



Ew tiştên jor dudu-dudu ji boyî hevin.
Gelo tu dikare wana bike cot ?

MELÎ

Allegretto

Me . lî, Me . lî, Me . lî, Me . lî, Me . lî,
Me . lî, Me . lî, Me . lî, Me . lî, Me . lî, Me . lî.

Melî, Melî, Melî,
Melî, Melî, Melî,
Melî, siwaro Melî.

Mala Şeniyê newalê,
Melî, Melî, Melî,
Melî, siwaro Melî.

Tajî berda xezalê,
Melî, Melî, Melî,
Melî, siwaro Melî.

Bû fitara êvarê,
Melî, Melî, Melî,
Melî, siwaro Melî.

Xweziya çavêr rindikê,
Melî, Melî, Melî,
Melî, siwaro Melî.

DU BIRA

Reşo û Serbest birayê hevdû bûn. Rojekê herdû bira bi hevre çûn zeviya xwe av bidin. Herdû bira heta nîvro xebitin. Piştî nîvro Reşo birayê xwe bi tenê li nav zeviyê hişt û bi mahna karêkî lêxist çû mal. Serbest da aqilê xwe û got :

Reşo ne ji bo kar çû. Ewî rûvîti kir, ji bo firavinê çû. Serbest ji mera xwe hilda da ser milê xwe û ew ji çû male. Wextê gihişt mal xwe da ber derî û guhdarî kir, bê ka hal-hewal çiye. Ewî dît ku Reşo li ser kulav rûniştiye û hêkerûnê dixwe. Diya Reşo jê dipirsî:



- Te ji bo çi ji birayê xwe ra hinek nehişt ?
Ne ew jî birçî ye ?

- Ê dayê, Reşo got: Çima tu nizanî, ku zikê me herdu bira yek e. Weki ku yeki ji me têr xwar, birayê din jî têr dibe. Dema ku Serbest ev gotin bihist, derî vekir û kete hundur. Reşo lezi pirsê kir û got:

- Bira te zevî xilas kir ?

- Na, Serbest bersiva wî da.

- Ê çima ? Reşo got; gerekê te xilas kiriba û paşê bihata. Lî, aliyê ne-avdayî wê çawa bibe ? Serbest got;

- Aliyê din, wê xwe-xwe avê bikşîne xwe, tu mereqa mekişîne.

Reşo zanibû Serbest ci got, ew ker bû, soro moro bû û deng jê nehat.

Temûrê Xelîl

MIJÜLÎ

XETÊN WÎ TU CAR JÊ NARIN



Heywanekî xwe li vê derê veşartiye.
Gelo tu dikare wî bibînî ? Navê wî
çî ye ?

ŞIVANÊ GUND

Üso şivanê gjndekî bû. Wek hercar Üso rojekê pezê gund dan ber xwe û bire çêranê. Ew hetani nîvro li dora gund li ber pezê xwe geriya û pez da çêrandinê. Lê vê rojê qet hedûriya wî nedihat. Ewi ji xwe re got:

- Bisekine, ezê iro gundiyan bixapînim! Üso dev ji pêz berda û bi bazdan ber bi gund de reviya. Bi dengekî bilind gazi gundiyan kir:

- Gur ketiye nav pêz! Gur ketiye nav pêz!
Dema ku gundiyanbihist, ku gur ketiye nav pezê wan, bi tivingan di gaziya şivanê xwe Üso de çûn. Çaxû ku gundi hatin, gihiştin ba pêz, dîtin ku pez li erdê mexel hatiye, û tu gur li wêderê tune ne. Gundî poşman vege riyan malên xwe. Üso bi wan keniya û got: - Min çawa ew xapandin.

Roja din Üso dîsa pez bire çêrandinê. Vê carê pez bir mîrga binahiya gund. Weke duhî cardi hedûriya wî qet nedihat. Ewi got:

- Ezê gundiyan wek duh carek din bixapînim!
Üso wek roja çûyi dîsa berê xwe da gund û gazi kir: - Gur ketine nav pêz! Zû werin! Gur ketine nav pêz! Guran pez xwarin!

Gundiyan wek roja çûyîn dîsa tifingê xwe gitin û di gaziya Üso da bazdan. Lê ewan vê carê ji tu gur nedîtin. Ew carek din şûnde vegeryan cûn malên xwe. Üso carek din bi wan keniya û

got: - Min dîsa gundi xapandin !

Roja sisyan dîsa Ûso pez da ber xwe û ji
gund derket ku wana bibe biçérîne.Ûso hetanî
êvarê pez da çêrandinê. Çaxa bû êvar û dinya
tarî bû, Ûso pez da dora xwe û ber bi gund de
çû. Li nêzîkî gund Ûso dît ku gurekî xwe li
pez girt û xwe dada wan. Ûso ji tirsan bizdi-
ya , pez tenê hîst û gazînî li gundiyan kir:

- Gur ket nav pêz ! Gur pez xwar !

Vê carê kesek di gaziya Ûso da neçû. Gundî
ji derewê wî aciz bibûn, bawer dikirin ku Ûso
vê carê jî derewan dike.

Gurê ku ket nav pêz çendek ji wan kuştin û
pir ji wan jî birîndar kirin.



PEYVÊN BERVAJIYÊN HEV

PEYY

law
mêr
bilind
xwes
sar
têr
çep
zaro
sist
roj
dirêj
raketî
zana
tarî
tehl
ko
der
mirîşk
pak
zelal
mezin
jêr
fer
res
bûk

BERVAJÎ

keç
jin
nimz
nexwes
germ
birçî
rast
mezin
pêt
şev
kin
hişar
nezan
ronahî
şérîn
tuj
hundir
dîk
lewiti
şêli
piçûk
jor
cot
spî
zava

SILAV ŞANDIN BO KULİLKÊ

Sosin di nav mîrgan geş bûn
Binefş li ber çeman xweş bûn
Nêrgiz di nav çiyan zer bûn
Silav şandin bo Kulîlkê


Alalan serê xwe rakir
Dilê genim garis şadkir
Canemêrga rabû barkir
Silav şandin bo Kulîlkê

Binerin ci divê beybûn
Kulên dilan dîsa derbûn
Tenê dibêje serxwebûn
Silav şandin bo Kulîlkê

Darêve geş bûne zeylan
Xortan jêkir,kir nav guldank
Kurdistan tev büye bîndank
Silav şandin bo Kulîlkê.

XEBATNAS

MIJÜLİ



Di vê mijüliya jori de ji hejmara yeka (1) heta hejmara nehan (9) binivîsin ku ji her ali û qorziyan de panzdeh derkeve.

4 / 2 3 / 5

1 3 / 2 /

1 2 / 1 3

1 2 /

Van hejmaran bike şes (6) kom ku her kom bibe şes (6).

XELO

Rojekê li gundeki mirovek bi navê Xelo hebû. Xelo êvarekê xwe tazi dike û radizê. Bê ka çawa dibe, bi şev xewnekê dibîne, ku ew û miroveki din bi hev diçin. Xelo nîvê şevê çavgirtî û tazi ji mal derdikeve, diçe nav gund, li nav gund dike hawar û dibêje:

- Hûûû ez bavê rebenê me, Hûûû... kuro qey tu min nas naki, keko birawo. Qaqibo, qaqibo, hûûû ... ez ferkê mala mera im, hûûûû....

Bi hawara Xelo ve gundi tev ji xew hişyar dibin. Li dengê Xelo diçin nava gund, dinhêrin ku Xelo şilfi-tazi çûye ser banekî û çawa nav di xwe dide. Gundî ecêb-mayî dimînin. Gundiyek ji wan ban dike:



- Kuro Xelo,çi bi te hatiye ? Qey tu dîn bûyî?
Bi gotina yê gundi Xelo ji xewê hisyar dibe,ça-
vên xwe vedike û dinhêre ku şilfi-tazi di nava
gundiyân da ye.Xelo ji şerman dibêje:

- Kuro kê ji we ez tazi kirime ? Qey ne şerm
e ? Kuro çawa ez tazi jî kirime,ez bi xwe ne
hisîya me.


Xelo, radibe serê xwe dixe ber xwe û diçe
mala xwe.Wê şevê ji kenan xew nakeve çavê gun-
diyan.

Birîndar

UCCIN MEDİN

* SÊRÊ SERÊN ÇİYAN * Huseyin

Ha vane
hejik.



Vê ca kewê
min tenê ma,
ez ê bipirtiki-
nim û pistre
bibirêjem.



Kewê xwe pirtikand...





...û raza



11




xii...xii




12

Roja din sibehê.



13

Ez serkî bi dûrbêna xwe
meyzênim bê ma ka 4 i
heya.




14

Hesin bi dûrbîna xwe li
dora şikettê di meyizênenê



15



34

Way...Way du
esker in !

Rajme firaxên xwe û ji vir
herim da esker min negirin



17



18

Rahîste firaxên xwe... {



19

...û ji wêde bazda,



20



21

Ez duri eskeran Kefîm
vêca ez karim hinkî
xwe rihat
kim.



35 22


Hussein SR

XACEPIRS




(5)

(1)	J	E	H	R
(2)	Q	I	Y	A



(3)



(10)

(3)	K	O	M	G	I	R	A	V
(4)	P	I	R	E	J	I	N	



(1)

(5)	F	I	R	O	S	K	E	R
(6)	B	A	D	E		K		



(13)



(14)

(2)	N	A	M	E	B	I	R
(8)	G	I	R	A	V		



(4)

(3)	T	I	F	I	N	G	
(10)	K	Ê	L	I	N	D	Î



(11)



(9)

(12)	K	U	L	î	Ç	E
(11)	V	A	G	O	N	




(1)


(13)	S	E	Q	A	W	Ê	L
(14)	D	E	R	î			



(8)



(6)



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA